# KOÇBERÎ

Qanûna koçberiyê têkildarî newelatiyên DYA'yê ye ku ne li Dewletên Yekbûyî dijîn. Ev qanûn destnîşan dike ka kesên ne li DYA'yê hatine dinyayê dikarin çawa hewlê bidin ku bi qanûnî vîzeyeke demkî yan daîmî li Dewletên Yekbûyî bistînin. Ji bo mexdûrên sûcan vîzeyên taybet tên dayîn.

Vîzeya U û ya T du cureyên vîzeyên demkî ne ji bo mexdûrêb sûcên diyar. Ji bo serlêdana van vîzeyan divê mexdûrê sûc di doza sûc de bi hêzên ewlekariyê re bixebite. Vîzeya U ji bo mexdûrên sûcên tundiyê ye ku Tundiya Navmalî, Tundiya Cinsî, Tacîz û Revandin jî tê de ye. Vîzeya T ji bo mexdûrên Bazirganiya Mirovan e. Ev vîze ji bo endamên malbatên mexdûrên sûcan jî tên dayîn.

VAWA (Qanûna li Dijî Tundiya li Jinan) vîzeyeke mayînde ye ji bo mexdûrên Tundiya Navmalî yên bi welatiyeke/î DYA'yê re yan jî bi keseke/î xwedî vîzeya mayînde re zewicîne.

Ev vîze tenê destûrê didin kesan ku bi awayê qanûnî li DYA'yê bijîn.  Ji bo bikarin serlêdana karekî bikin, divê xwediya/ê vîzeyê serî li destûra xebatê jî bide.  Xwediya/yê vîzeyê dikare serî li vîzeyeke mayînde ya DYA'yê jî bide.

Qanûna koçberiyê mijareke aloz e, em pêşniyar dikin, heke pirseke we li ser koçberiyê hebe bi parêzerên qanûna koçberiyê re têkiliyê daynin.

[U.S. Citizens and Immigration Services]